


# Li Sazîya Dorset NHS a Nexweşxaneyên Zanîngehê di Beşa Lezgîn da Lêkolîna Vîrûsa Xwînê

**December 2024**

**Ger hûn li Sazîya Dorset NHS a Nexweşxaneyên Zanîngehê, Beşa Lezgîn (A&E) testa xwînê kirine, hûn ê ji bo HIV, Hepatît B, û Hepatît C jî werin ceribandin. Testkirina BBVs di Beşa Lezgîn da li ser bingeha testa 'opt out'ê (testa bêyî serdankirinê) ye. Ev tê wê wateyê ku heke we mînakek xwînê wekî beşek ji lênihêrîna we were girtin, em ê bixwe testa BBVs bikin.**

## Pirsên ku pir caran têne pirsîn

## Çi diqewime?

Tenduristiya Neteweyî ya Înglîstan û NHS Improvement (NHSEI) testa 'opt-out'ê li beşên lezgîn ên li deverên desthilatdariya herêmî yên herî berbelav, rêyek bi bandor a piştrastkirî ji bo destnîşankirina dozên nû berfireh dikin, û dê di sê salên pêş da £20m veberhênan bikin da ku piştgiriyê bidin vê çalakîyê. Sazîya Dorset NHS a Nexweşxaneyên Zanîngehê, Beşa Lezgîn jî beşdar dibe. Herweha vê firsendê ji bo destnîşankirin û piştevanîya kesên bi vîrusên xwînê -HIV, Hepatît B û Hepatît C ye.

- **Testkirin rolekî pir girîng dilîze da ku heya sala 2030-an enfeksiyonên HIV-ê yên nû, mirin û stigma bigihîje sifir.**
- **Daneyên dawî yên @UKHSA nîşan da ku nêzîkî nîvê (42%) welatîyên Înglîstanê di sala 2020-an da ku bi HIV-ê ketine, dereng hatine destnîşankirin.**
- **Mirov dikare demek dirêj bêyî nîşanek bi HIV-ê ra bijî, û taqîkarî yekane rê ye ku hûn rewşa weya HIV-ê bizanibin.**

- **Ger HIV-ê we heye, agahdarîya we tê vê wateyê ku hûn dikarin dest bi dermankirinê bikin, sax bimînin û xwe ji veguhastina vîrusê ji kesekî din ra dûr bixin.**

**Mebesta me ji BBVs çi ye?**

**BBVs-yên ku di vê çarçoveyê da têne dîtin HIV, Hepatît B û Hepatît C ne.**

**Bi rastî divê em ji bo çi lênihêrînê bikin?**

Hepatitis C - HCV antibody,

Hepatitis B – HbsAg

HIV (Vîrûsa kêmasîya parastinê ya mirovan) – (Ab and Ag P24)

**Ez çawa dev jê berdim?**

Ger hûn naxwazin xwîna we ji bo Hepatît B, Hepatît C an HIV were taqîkirin, ji kerema xwe karmendê/a ku xwîna we digire agahdar bikin.

**Çima xwîna min ji bo HIV, Hepatît B û Hepatît C tê taqîkirin?**

Her vîrus xwedan rêbazên çareserkirinê yên ciyawaz e. Hemû dermankirin ewle, bandor û hêsan in. Van dermanan dibin alîkar ku hûn tendurist bimînin û pêşî li belavbûna vîrusê bigirin. Hepatît C dikare bi tevahî were dermankirin. Bi dermankirina guncav, hûn dikarin hêvî bikin ku jiyanek dirêj û tendurist bijîn.

**Gelo dermankirina HIV, Hep-B û Hep-C ji bo her kesî belaş e?**

Erê, hemû kesên ku li UK destê wan bigihîje lênihêrînê, dê bikarin belaş dermankirinê bistînin.

**Gelo kesên ku ne welatîyên UK ne bi lênihêrîna rast werin piştgirîkirin?**

Dermankirin ji bo herkesî belaş e, bêyî liberçavgirtina rewşa koçberiyê û yên ku destê wan nagihîje pereyên giştî. Ji bo nexweşên ku ji welêt têne derxistin jî dibe ku heya 3 mehan dermanên destnîşankirî were dayîn û her gav qursek dermankirina Hep-C ya tevahî berdest e. Ji bo HIV û Hep-B, dermankirin û piştgirîya standard ya NHS dema ku li welat in têne dayîn, û kesên ku çareserîyê werdigirin dê bi şêwir û rawêjkirinê werin piştevanî kirin da ku piştrast bikin ku piştî derketina UK ew dikarin bi berpirsiyarî lênihêrîna xwe birêve bibin.

## Ma ez ê ji testa xwe agahdar bibim?

- **Ger encama testa we neyînî be...**

Encamek neyînî tê wê wateyê ku dema me test kir Hepatît B, Hepatît C an HIV tunebû.  Hûn ê neyên agahdar kirin.

- **Ger encama testa we erênî be...**

Ger taqîkarîya we reaktîf (pozîtîfek demkî) be em ê bi we ra têkilî daynin û alîkarîya we bikin da ku hûn ji bo nîqaşkirina gavên pêşerojê rasterast têkilî bi navendek pisporîyê ra saz bikin.

Ger em nikaribin testa we ji ber sedemên teknîkî bişopînin, dê ji hêla endamek tîmê ve bi we ra têkilî daynin û pêşniyaza testekî nû ji we bikin.

## Ji bo bêtir agahdarî divê ez li UHD pêwendî bi kê ra bikim?

Ger pirs û nîgeranîyên we hebin, hûn dikarin bi Tîma Hemşîre ra bi 07795 914621ra têkilî daynin.

Hûn dikarin di 24/7 (24 saet di 7 rojên hefteyê da) peyam ji mer ra bişînin, lê ji kerema xwe bala xwe bidinê ku peyam tenê ji Duşemê heta Înê, 9-5-ê êvarê têne bersivandin (ji xeynî betlaneyên bankê).  Ger karmend mijûl bin, hûn dikarin peyama xwe bişînin, û ew ê di demek zû da bersiv bidin.

## Ger agahîyên pêwendiya min biguhere çi dibe?

Ji kerema xwe teqez bin ku agahîyên rast yên pêwendîkirinê bi we ra (herî kêm hejmarek têlefonê) li ba me hene da ku encama testê bigihîje we.  Ger hûrguliyên têkiliya we di nav hefteyek piştî ceribandinê da biguhezin, ji kerema xwe me agahdar bikin.  Hûn dikarin agahîyên pêwendiya xwe bi xebatkarên mey an bijîjk an hemşîre ku lênihêrîna we dabîn dikin piştrast bikin da ku em dilniya bin ku hûrguliyên pêwendîyê rast in.

## Ger ez nexwazim li ser van vîrusan zanibim çi?

Em her kesê ku ji rewşa xwe nizane han didin ku were taqîkirin.  Zanîn û dermankirin dikare jiyana we rizgar bike.  Ger hûn naxwazin werin testkirin, ji kerema xwe karmendan agahdar bikin.

## Kî dikare encama testa min a erênî bibîne?

Encamên testa we, mîna hemî encamên testa NHS, nehênî ne. Ev tê vê wateyê ku tenê karmendên lênihêrîna tenduristî yên NHS yên ku di lênihêrîna we de têkildar in dê bigihîjin encamên testa we.

## Ez li ku derê bêtir dikarim agahdarî li ser van vîrusan bibînim?

### Hepatitis B

| | |
|---|---|
| NHS (Hepatitis B page): | www.nhs.uk/conditions/hepatitis-b |
| British Liver Trust: | www.britishlivertrust.org.uk |

### Hepatitis C

| | |
|---|---|
| NHS (Hepatitis C page): | www.nhs.uk/conditions/hepatitis-c |
| Hepatitis C Trust: | www.hepctrust.org.uk |

### Human Immunodeficiency Virus (HIV)

| | |
|---|---|
| NHS (HIV and AIDS page): | www.nhs.uk/conditions/hiv-and-aids |
| Do It London: | www.doitlondon.org |
| National AIDS Trust: | www.nat.org.uk |
| Terrence Higgins Trust: | www.tht.org.uk |